EW KARWANÊ HEŞT HIZARÎ

Nîşan Bamernî

Ew nêrgizên..
Xunava xwe ji şevbayê keviyan girtî
û
Xîsara bejina te av dida
Ketin ber hewên kopekan
Di ber biskan re şewitîn
Barovî ji pirça te dizî û..
Bêhin neda,
Li bin tekelên ..îva û zîlan
Ax bû birîn
Hensa min..
Bû srîneka toza şayayî
Di gel hêtîna ruhê çû,
Ewrên kujek..
Lê êwirîn

Kirin babelîsk û
Beserûşînîyê dirîn,
Di hinavên..
Ew ê biyabana hişk de
Xwîz..heldipeqijî û
Dibû saçimê û
Ji birînên
Befrêka tênî dibarîn,
Xwîn
Di mencela..
Nugretselman de difrriya
Efrîtan bihina wê hildimijî û

Reş e seyên..
Heçacê har..dialîsî,
Ew biyaban
Dibû dehbe û
Goşt ji qereqodan divAerojî
Di dozekxa zikê wê de
Şel û şepik..
Ji bihina mirinê qemiyan
Bûne tîverêz û tîtal
Li ser hestîkan helaweriyan
Êdî..êşan..
Di nav..
Kumira bedena min de neman
Agirê wan dibû kenî û
Di çavên evîna te de digeriyan,
Rondik.. ji wan
Davên hîzara serê te
Dibûne kifin û
Di wê jivana berze de
Xwe di darbesta eşqê werdikir û

Li ser milên behîçinan..
Rê lê berze
Nedizanî kîve diçûn û..
Dê kêve çin..
Lewma.. heya niha
Pirça dayika min
Li ser şeyê xemê aloz dibe û
Çaverêbûneka kor e..
Li serê rêyan vediçire,
Zêmara di sîngê wê de..
Helemûrek a jana ye û
Hêş kovaneka..
Devtîj a cerg bire, zarokên wê..
Li dîv bihna xwînê diçin
Xerîbin ew
Ji babê xwe têr nebûne û

Di hembêza henekan de
Qebokanê û..
Binkefişkanê germ ne kirine,
Hêş..
Ew şev e..
Bîst û sê salan dirêj bûy..
Ya mayî..
Bêdawî nebûye,
Merg...
Xewneke
Bi kabîsê hiziran re diçe û
Li heşt hizar..
Barzaniyên te digere
Di şevereşa rêya te de
Di gel rijiyana stêrkan digre û
Ji hêza wan
Tirojkên jiyanê çê dike
Roj..
Di destên min de
Esîr dibe,
Bêdengiya elindeka sipî
Ji goristana hestîkan
Radibe û
Berev rengên..
Alaya pîroz ve diçe
Ew deryayê ji rondikan
Di asmanê çavên te de
Bûye şkêre
Ji keskûsorî vedibe û

Hestîkên te û
Wan kiloxkên dev bi kenî
Ji toza biyabanan dişo û
Radibin ve,
Mirin...
Li hemberî..
Hevrikaniya te,
Ji xwe şerm dike û
Ji hebona te dikeve,
Lê..
Dîsan jî
Li ser giyanê axa te
Şînwarên qamçiyan reş in..
Jê neçûyine,
Ew birînên gulan sumtîn..
Di germ û geş in..
Sar nebûne
Û dê mînin.. û dê hêlîn
Û dê keyne
Tabloyên perwerda kurdî
Da ku sibe
Ew karwanê heşt hezarî
Raneweste
Di gel nifşên dîroka me
Zindî bibe û
Biçe, biçe, biçe
Û biçe,... Û biçe,... Û biçe,

30/6/2006/vêsteros